

**ABDULLA PEŞÊW**  
**HILBIJARTIN**  
**Ji Hemû Dîwanên Wî**

### **Abdulla Peşew**

Di sala 1946'an de, li bajarê Hewlêrê çêdibe. Bavê wî şair û mela bû, lê gava ew di temenê 2-3 salî de ye bavê wî dimire. Xwendina seretayî û Enstîtuya Mamostetiyê li Hewlêrê tamam dike. Di navberên salên 1970'yî û 1973'yan de li gundên nêzîkî Hewlêrê û li nava Hewlêrê mamostetiyê dike. Di sala 1973'yan de diçe USSR'ê (Rûsyaya Sowyetîk).

Di sala 1979'an de li Moskowê li Enstîtuya Zimanên Biyanî Koleja Tercumaniyê beşa Îngilîzî-Rûsî tamam dike. Li ser hunerên tercumaniyê dîplomaya (bawernameya) mastirê distîne. Di sala 1984'an de, dîsa li Moskowê li Enstîtuya Rojhilatnasiyê dîplomaya doktoraya edebiyatê (zanistên filolojiyê) werdigire, tez û babeta doktoraya wî li ser şair Pîremêrd e. Di navbera salên 1985'an û 1990'î de, li Lîbyayê li bajarê Trîpoliyê (Trablûsê), li Zankoya El Fatîhê mamostetiyê dike.

Yekem helbesta wî di 1963'yan de, di *Rojnameya Hewlêrê de* belav dibe. Yekem dîwana wî di 1967'an de, li bajarê Kerkûkê çap dibe. Heta niha heft dîwanên esasî çap kirine, gellek lêkolînên edebî û zanistî li ser wî hatine nivîsîn. Niha li Finlandê dijî.

« Şîrên Peşêw bi giştî deşteke bêsinor, bihuşteke fireh û dojeheke bêbinî ye. »

**Prof. Maruf Xaznedar**, *Karwan (Kurdî)*

„Jiyana gelê Kurdên bindest dijwar e, lê tiştê dilxweşker ev e ku çavkaniyeke bihêz û şaîrekî bêtirs ê Kurdan heye li Helsînkiyê.“

**Nivîskarê Fînlândî Simokka Virkulla**, *Aamulehti (Fînlândî)*

„Ew (Peşêw), di nava şaîrên azadnivîs de, bi raya min, pêşeng e.“

**Hejar Mukiryani**, *Keyhan (Farisî)*

„Abdulla Peşêw yek ji şaîrên herî xoşewîst ê gelê xwe ye.“

**Şaîrê Îranî Seyid Alî Salihî**, *Dunya-î Suxen (Farisî)*

„Abdulla Peşêw, ger ku helbestvanê Kurd ê herî baş û xoşewîst nîn be, guman tê de tune ye ku ew yek ji şaîrên xoşewîsttirîn ên çar perçeyên Kurdistanê ye.“

**Kar** (*Farisî*)

## **FUTBOLL**

Ajansekanî dengubas rayangeyand:

Yariyekî futboll dekirê.

Dû tîpeke – Kirêmil û Koşkî Spî.

Top – Serî kurd.

Goll – Kurdistan.

Temaşaker – dinyay kirrî wek gorristan.

3. 11. 1973. Moskow

**dengubas** : nûçe. **rayangeyand** : ragihandin. **yari** : lîsk. **tîp** : tîm. **temaşaker** : temaşevan, **kirr** : kerr.

## **MERC**

Min qet dijê ewe nîm  
diktator cîhan bigirin,  
sêberî Xwa bin, zor bin.  
Bellam mercêkim heye:  
Minallan diktator bin!

22 / 23. 1979 Berlin - Warşowa

**merc** : şert. **sêber** : sî, sih. **Xwa** : Xwedê. **minall** : zarok.

## **XENCER**

Min xencerêkî rûtim,  
nîştimanî min û zam - kalanêkî dizrawe.  
Kes nellê be xwên tînûm!  
Yexey kalandiz bigrin –  
ew minî hellkêşawe!

16. 7. 1991. Staremînskaya. Mînsk

**zam** : birîn. **dizrawe** : hatiye dizîn. **nellê** : nebêje. **hellkêşawe** : ji kalanê derxistiye.

## NÎŞTIMAN

Beheşt û dozex bo min taze nîn.  
Hawkat û hawcê,  
ewîşim dîwe, emîşim dîwe:  
Nîştimanî min, le wetî heye,  
beheşt e û dozex dewrî tenîwe!

28. 11. 1995. Hêlsinkî

## EGER EMCARE BÊMEWE

Eger emcare bêmewe:  
beyaniyan;  
wek berxoleyekî sawa,  
le naw qersîlî parawa,  
til dexom û giyayêkî tift têt têt decûm,  
ta kift debim,  
pê û belekim le şewnimî sard helldesûm!

Eger emcare bêmewe:  
wek simore,  
be darguêze berzekana helldegerrêm.  
Wek pelle hewrêkî newî  
ber ser kêllge sewzekana dexulêmewe.  
Wek şengebî,  
be ser çema,  
be ser gişt zinarekanî  
kenara  
deçemêmewe.  
Ax! Bes emcare bêmewe!

Eger emcare bêmewe:  
Serenc dedem,  
gulle genim çon zerd debê,  
hernar û sêw çon pêdegen,  
qetiyekan  
hêlaneyan çon çêdeken!  
Serenc dedem,  
zerneqûte çon ball dergê,  
perresêlke koçerekan  
le ser têlî karebay rê, çon rêz debin  
cogelekan le kuêwe dên...  
Bo kuê deçin!

Eger emcare bêmewe:  
Le goy memkî her kaniyêk,  
qume awêk dexomewe  
giştyan dekem be daykî xom,  
le her eşkewtêka,  
şewêk,  
ser be gaşe berdêk dekem  
giştyan dekem be lankî xom!

Eger emcare bêmewe:  
Zimanî girr dehênimewe –  
bo lalekan  
şaperrî girr dehênimewe –  
bo firrinde bêballekan!



Eger emcare bêmewe:  
nahêllim lawan gull biçinin  
bo guldanî mirdûy ser mêz  
fêryan dekem,  
ke çûne jîwan,  
le berokî kiçanî den  
pêş ewey biyankene amêz!

Eger emcare bêmewe:  
- Minallanî Moskoy çawşîn fêryan kirdûm –  
bê şîrînî ser nakem be hîç mallêka,  
zor colaney nerm û sade  
bo minallan helldebestim,  
le cejnî ledayk bûnyana  
- ke niyane ! –  
beşdar debim,  
lebatî mom, dadegîrsênim engustim  
girr berdedem le gilêney çawekanim,  
le sawatîrîn hellbestim!

Eger emcare bêmewe:  
Her bêşkeyêkim bête rê,  
beşêneyî,  
beserya denûştêmewe.  
Ax, minallan!  
Ax, bes emcare bêmewe!

16. 5. 1975. Moskow

2

Ey daye giyan:  
Le yadme, ke minall bûm  
eşqî tamî tift û tall bûm –  
Gillim dexward,  
qurrim decû,  
toş, zilleyekit lê dedam  
hemût pê turr firrêdedam!

Ey daye giyan:  
Ksta, gewrem û minll nîm  
eşqî tamî tift û tall nîm.  
Keçî, eger emcareşyan  
rêm bikewêtewe Bêrkot\*,  
lêşim bidey,  
lêşim heram key şîrî xot,  
min be teşîyekey minllî derrêsmewe –  
dar, berd, gill, qurr,  
çîm bête rê deylêsmewe!

17. 12. 1975. Moskow

\*Gundêkî biçkolaney bin Hewlêre, cêy hatine dinyay şa'îre.

**berxole** : berx. **qersîl** : hişînahiya taybetî ya ku pez lê diçêre. **paraw** : avdar. **til** : gurz.  
**tilxwardinewe** : tulquzîvedan. **tift** : nîv tal û nîv tûj. **kift** : westandin. **belek** : çîp. **helldesûm** : şil dikim. **berzekan** : yên ku bilind. **newî** : nivî; nizm. **dexullêmewe** : dizîvirim; tîm û diçim.  
**gulegenim** : weşî. **qeteyekan** : ketî. **zernequte** : çêlikên çivîkan yên ku nû ji hêkan derketine.  
**perresêlke** : dûvmeqesk. **go** : gumk; serê memikan. **qume awêk** : kulmeke av. **gaşebird** : zinar. **ser mêz** : ser masê. **berok** : yaqê; hambêz. **engust** : tilî ; bêçî. **be şêneyî** : hêdî.  
**denûştêmewe** : xwe diçemînim. **gill** : ax. **qurr** : herrî; çamûr. **zille** : sîle. **deylêsimewe** : dalêsim.

## MEZAD

Kê kirryar e?  
Herçîm heye,  
hemûy tallanfiroş dekem:  
Kê kirryar e?  
Dey, werine pêş!  
Fermûn: Eme kalaney çaw,  
birrbirrey pişt û kaseser,  
kilawî Kerîm Xanî Zend,  
şîr û zirrêy Selaheddîn,  
mêjûy lingeuqûçî bêber,  
yeke yeke  
bendekanî peymanî morfînî Sîver, \*  
dendekanî niyandirtallî  
pîre eşkewtî Şaneder!

**kalaney çaw** : palîkên çavî. **birrbirrey pişt** : karîteya piştê; stûnka piştê; derzika piştê. **kaseser** : kiloxê serî; qoqê serî. **killaw** : kum. **şîr** : şûr. **zirê**: zirx. **dende** : masûlk; perasû; zîperr; zebek, **pîreşkewt** : şikefta pîr; ew bi navê Şikefta Şanederê navdar e, ku tê de hestiyên mirovê Niyandirtallî dîtin.

Kê kirryar e?  
Herçîm heye,  
hemûy tallanfiroş dekem:  
Suwallet û ateşkede,  
dîwanseray şahekanman  
be binçîne û binyadewe,  
berdenûs û nexş û nîgar  
be text û tacî Madewe ...

Mezad ... mezad ...  
herçîm heye, hemûy mezad ...  
be perçeyek perroy sade,  
ke hellbikirê û bişnêtewe  
li ser bistêk zewî azad!  
Mezad ... mezad ...  
herçîm heye ... hemûy mezad!

**suwallet** : alavên kevn û qîmetdar. **ateşkede** : agirdank, li peristgeha Zerdeştîyan. **binçîne û binyad** : bingeh û esas. **berdenûs** : kevirên (berên) li ser nivîsandî. **perro** : paç. **hellbikirê** : bê rakirin, **bişnêtewe** : bimilmile. **bistêk** : bihostek.

\* di peymanî Sewrê de çend bend hebûn ku behsa projeya dewleteke Kurdî dikirin.

## SERBAZÎ WIN

„Gul le ser derya danên“  
Andrêy Voznîsênski

Ke wefdê deçête şwênê,  
bo ser gorrî Serbazî Win  
tace gullîneyek dênê.

Eger sibey  
wefdêk bête willatî min,  
lêm bipirsê:  
“kuanê gorrî Serbazî Win?”  
Delêm:  
“Gewrem!  
Le kenarî her cogeyê,  
le ser sekoy her mizgewtê,  
le ber dergay,  
her mallê,  
her killêseyê,  
her eşkewtê,  
le ser gaberdî her şaxê,  
le ser dirextî her baxê  
lem willate,  
le ser her biste zemînê,  
le jêr her geze asmanê,  
metirse! Kemêk ser daxe u  
tace gullîneket danê!”

5. 11. 1978. Moskow

**serbazî win** : serbazê winda; cangoriyên ji bona welêt ketine û nenaskirî ne. **wefd** : şande.  
**tace gullîne** : gulwaz ; tacegul. **gorr** : gor; gorne; tirbe. **gewrem** : mezinê min. **seko** : sewkî.  
**gaberd** : zinar. **bist** : bihust. **geze** : gaz.

## MUZÊ

Le Kurdistanî diwarroj da  
gewretirîn muzêy dinya dirust dekem.  
Bo her çaxêk hollêkî zil.  
Hollî yekem nawî lê denê  
hollî çaxî ber le dîrok...  
hollekanî tir hemûyan:  
Hollî sungê û kellbe û rinok.

1. 11. 1988. Trablus

**muzê** : entîkxane; methef. **diwarroj** : dema tê; pêşeroj. **gewretirîn** : mezintirîn. **zil** : mezin û fereh. **nawî** : navê. **kellbe** : kulm. **rin** : şirn; diranên kûçikan.

## **KURDISTAN**

Kêlge destirê bo baran  
çiya bo hello.  
Rûbar û çem bo newestan  
xor bo aso.  
Agirperist bo ateşge  
ba bo çiro.  
Estêre û mang bo spêde  
minîş bo to  
Kurdistanim: Minîş - bo to!

5. 10. 1977. Moskow

## NEWROZÎ 1977

To mişûrî agir mexo.  
Serit le ser singim danê,  
bizane, killpe û nêlley girr  
çi deka bo em Newroz e!  
Minîşser be baskit dekem,  
way bo şewî tarîkî wa.  
Baskî rûtî çî agirêkî pêroz e!

20. 3. 1977. Moskow

**mişûr** : xem. **killpe** : pêt; billêse; rivîn; alaf. **nêlle** : gurgura pêtê. **bask** : çeng; çengur

## **XUNAW**

To dillope xunawêkî  
le ser gellay umrî behar.  
To, giyanekem, kiçî şewî.  
Zor detirsim nêzîkit bim,  
newek bitikêy bo ser zewî!

17. 11. 1995. Hêlsinkî

**newek bitikêy** : ne ku tu birijî; bikevî.



## **GULLEBERROJE**

Nîştimanî min:  
Hêlaney xor e,  
pirşingecarr e.  
Serim... Ser niye:  
Gulleberrojey hemîşe lar e!

13. 4. 1989. Terablus

**xor** : tav; ro. **pirşingecarr** : baxçê tîrêjan. **hemîşe** : tim. **lar** : xwar.

## ÇEND WIŞEYÊK DERBAREY DILLÎ XOM

Dillî min çeşnî wagonî qîtarêk e  
hezar û yek wêstgey heye.  
Le her yekê lew wêstgane rabiwestê,  
rêbwarêk becêy dehêllê,  
rêbwarêk xoy tê depestê!  
Bellam! Lewetî dillî min bote wagon  
rêbwarêkî pestî tiyaye.  
Danabezê.  
Danabezê.  
Le sûçêkî em dinyaye.  
Em rêbware be diway nawî xoyda wêle  
em rêbware be diway çawî xoyda wêle  
em rêbware birîn me  
em rêbware zerdexene û girîn me.  
Em rêbware Kurdistan e.  
Laney yekem evîn me.

22. 11. 1974. Moskow

**wişe** : bêje; peyv. **çeşnî** : weke. **qîtar** : trê; şemendefêr. **wêstge** : rawestgeh. **rêbwar** : rêwî; musafêr. **danabezê** : jê dernakeve. **sûç** : qunc. **zerdexene** : bize; beşer; kenê sivik. **lane** : landik.

## LE KATÎ BORDUMAN DA

Agirbaran e...  
Agirbaran e...  
Kamyan hellgirim?  
Kamyan derbaz kem?  
Emyan nexoş e û nobereman e.  
Ewî dî taze pêrrewke buwe,  
çaw pîrr bîbîl e, dem pîrr ziman e!

Du destim hebûn:  
Yek dujmin birdî, yekêkim mawe ...  
Kamyan hellgirim?  
Kamyan derbaz kem?  
Emyan bendî dill,  
ewî tirîşyan gilêney çaw e!

Seretay 1990. Trablus

**borduman** : bombebaran. **kamyan** : kîjanî. **nobereman** : berê me yê nû ye. **pêrrewke** : yê bi pê; bi ser lîngan ketî. **bîbîl** : bîlanok; bîbok. **bendî dill** : dilbend. **gilêne** : bîlanok; bîbok; bîbî.

## ŞÊTÎ

Dezanim, to - wişeyekî.  
Bellam zor car, bo wişeyek,  
honraweyekim kuştuwe!  
Dezanim, to - xunçeyekî.  
Bellam zor car, bo xunçeyek,  
gullcarrêkim cêhêştuwe!

Tiştirînî Duwemîn 1979. Moskow

şêt : dîn. **wişe** : peyv. **honrawe** : helbest. **xunçe** : xunce; gupik; bişkoje. **gullcarr** : gulistan.

## LE BAXÊK DA

Piyawêk serî be şanî  
şorrejînek kirduwe -  
zaroyekî arame û  
le bêşke da nûstuwe!

Xozgem be xoy!

Min wek ew nîm, boye çawim pêy hellnayê -  
min çend carê ser be şanî jinêk dekem,  
le ber sirtey jinanî dî xewim nayê!

3. 3. 1983. Moskow

**piyawêk** : mirovek. **şan** : mil. **çawim pêhellnayê** : çavê min bar nabe. **sirte** : pistepist.

## GENCÎNE

Lewsawe dinya dinya ye,  
ademîzad  
eşqî gewher,  
sewdaserî zêrr û zîw e.  
Le pêrawyan  
binî derya u  
qulley kêwî pişkinîwe.  
Keçî min hemû sibeynan  
gencîneyek dedozmewe,  
ke debînim kezî û biskit  
nîwey balîfmî tenîwe.

10. 8 .1984. Odessa

**gencîne** : xezîne. **lesawe** : ji wê dema. **sewdaser** : ewdalî. **le pêrawyan** : ji bo wanan. **qulley**  
**kêwî** : serê çiyê.  
**pişkinîwe** : keşfîkirin. **dedozmewe** : dibînim; îktîşaf dikim. **tenîwe**: nuxumiye.

## HÎWA

Le katêk da,  
le serewe, le lutkekan,  
tof û ziryan le dewen û daran werdên,  
xemit nebê -  
le binewe, le dollekan,  
giyay newxîze û gopke derdên.

25.12.1988. Trablus

**hîwa** : hêvî. **lutke** : lûtke; pûkese; tepel; nuqta tewrî bilind a cihekî. **tof** : bager; babêç.  
**ziryan** : bapeşk. **dewen** : devî; rêl. **doll**: newal; gelî. **newxîze** : giyayê nûderketî; zîl, nestîle.

## **DÛ AWABÛN**

Danî êwaran

Serenc dedeme awabûnî xor...

Dezanim minîş, zû bê ya direng,  
debê awa bim.

Bellam, mixabin, demî awabûn  
wekû zerdeperr sîhrawî nabim!

7. 1. 2000. Hêlsinkî

**zerdeperr** : zerdelper; tavzerk.



## ŞÎR

Ta dê şî`i rim xoştir dewê,  
çunke şî`ir, wek şoxêkî dû dill waye –  
hemû rojê,  
cê û katî jiwan nîşan dekeyn.  
Be degmen dê... Ya her naye!

16. 2. 1975. Moskow

şî`ir : helbest. **be degmen** : kêncarî.

## ŞAKAR

Hellbestim zor in:

Hendêkyan – şar in,

hendêkyan – gund in,

hendêk – telar in,

hendêk - xanîley tepîw û newî.

Bellam ewaney bo tom nûsîwin,

debin be şakar,

be rûnaktirîn paytextî zewî!

Huzêranî 1982. London

**şakar** : karên tewrî baş. **hendêkyan** : hinek ji wana. **şar** : bajar. **telar** : koçk. **xanîle tepîw û newî** : xaniyê nizm; nebilind.

## **RIWALLET...**

Wa le ser pişt rakşawim,  
be riwallet asûde û aram...  
Goşeyekî zewî heye û xor naybînê,  
min lêrerra lêy be agam –  
dengubasî her pengrêk le kuanû da,  
nûçey terzî her darmêwêk degate lam.  
Satewextêk, depişkwêm  
wek Kerkûkî newrozekey newetuyek:  
Çirkesatêk, le Hellebcey şazdey martîş dilltengtirim.  
Be riwalletîş,  
wa le ser pişt rakşawim,  
le bîstokî telefonêk bêdengtir im.

30.3.1998. Hêlsinkî

**riwallet** : dîmen; dîdar. **be agam** : jê hişyar im; hayê min jê heye. **kuwanû** : agirdank. **terz** : şiqin.

## SÛSEKERDIN

Pencere dekemewe.  
Momêk dadegîrsênim.  
Be çepkêk gulî kêwî  
guldanêk dexemlênim.  
Be dewrî serînim da  
zullaltirîn şî `i rî xom depirjênim wek şewnim –  
şew direng e û dezanim: Gulbejnêk dête xewnim!

22. 7. 1992. Gundî Şûkîna

**sûsekirdin** : dikeve bal û zêhnê; pêhesîn, **dadegîrsênim** : vêdixînim, **kêwî** : çiyayî,  
**zullaltirîn** : zelaltirîn; ronahîtirîn, **depirjênim** : direşînim; belav dikim, **şewnim** : xunav.

## TEMEN

Ta tom hebê, azîzim,  
min çîm le mang û salle?  
Hêşta zerrnequte bûm  
rîşî xemim spî bû, demgot şadî mehalle!  
Kstaş le say evînta,  
wa be kollê sallewe  
taza pêrewke debim, demim pîrr girrugall e!

13. 6. 1993. Rûssya, Gundî Tşîrîkova

**temen** : jî; emir. **zerrnequte** : cûcelok; cûçke; çelika çivîkê. **mehalle** : ne berpa ye; naye bi cihanîn; mustehîl e. **rîş** : reh; tamar. **koll** : piştî giraniya wan salan. **girrugall** : ixê; dema zarok hîn nikare bipeyive, ixê dike.

## ŞEWNWÊJÎ NAMOYAN

1

Le her cêyek çiya bibînîm -  
dillim,  
wek le jiwanî yekem da,  
dadexurpê, radeçillekê,  
sersam dewestîm le binya ...  
wa têdegem,  
le çiyayî min ra dest pê deken  
çiyayekanî hemû dinya!

**şewnwêjî** : şevnimêj. **namoyan** : biyaniyan; xerîban. **le her cêyek** : li her cihekî.  
**dadexurpê** : dil lê dide. **radeçillkê** : dil dilerze. **sersam** : sergerdan; matmayîn.  
**dewestîm** : disekinim; radiwestim.

2

Le her kuê kanî bibînîm -  
dillim,  
wek le jiwanî yekem da,  
dadexurpê,  
radeçillekê,  
pêşewey bînî pêwe nê,   
le berdemya  
be hêminî çok dadedem,  
qewzey serî  
wek şabiskî şorrejinêk  
şane dekem,  
çunke min wam be bîr da dê,  
ke şîrnawî gişt kaniyekan  
le nîştîmanî min ra dê!

**le her kuê** : li her kuderê. **pêşewey bînî pêwe nê** : berî ku devê xwe têxînim. **le berdemya** : li pêşiyê. **be hêminî** : bi bédengî; bi aramî. **çok dadem** : çoka xwe datînim.

**qewze** : kevz. **şabisk** : biska, keziya, guliya herî ciwan. **şorrejinêk** : ridtirîn; bedewtirîn jin. **şane dekem** : şeh dikim. **wam be bîr da dê** : weha bi bîr tînim; difikirim. **şîrnaw** : ava şêrîn.

3

Sermay gelêk şaranîm dî,  
belam pencem lego neçûn,  
çunke sermayî hemû cêyek  
tîşkêk rojî nîştîmanî minî tiyaye.  
Germay gelêk şaranîm dî,

bellam giyanim werris nebû,  
çunke germay hemû cêyek  
sirweyekî nîştimanî minî tiyaye.

**şar** : bajar. **pence** : tilî. **lego neçûn** : netevizîn. **tîşkêk** : tîrêjek. **werris** : bêzar; ji xwe  
aciz bûn, **sirweyek** : bayekî hênik.

4

Çawî kîjî ewrupayî  
ger şînîş bê - xoşim dewê.  
Ger sewzîş bê - xoşim dewê.  
Wa têdegem:  
Şîrintirîn çaw,  
sewztirîn çaw  
lem dinyaye,  
tozêk reşî  
çawî kiçî  
nîştimanî minî tiyaye!

**çaw** : çav. **kîj** : keç; qîz. **xoşim dewê** : bi min xweşe; jê hez dikim. **sewz** : kesk. **tozêk** :  
kêmek; hindikek. **kiç** : keç; kîj; qîz.

5

Nîştimanîm!  
To wek taney le ser çawim.  
To wek temî,  
le gişt lawe dewret dawim.  
To awêney -  
le naw to da hemû dinya bedî dekem.  
To teymanî -  
be hoy towe hîç nabînim:  
ne kel debînim, ne zewî.  
Ne Xwa debînim, ne esman.  
Ca nazanim  
ne cîhan wek to biçûk e,  
ne to gewreyî beqed cîhan.  
Nîştimanekem – K u r d i s t a n!

29. 11. 1979. Moskow

**tane** : perde. **tem** : tem; mij. **li gişt lawe** : ji her aliyekî de. **awêney** : eyne; neynik.  
**bedî dekem** : dibînim. **teyman** : çeper; sinc; perjîn. **be hoy to** : bi sedema te. **kel** : aso;  
hesû. **Xwa** : Xwedê, **gewre** : mezin.

## KUDETA

Pêş to nasîn  
minallêkî xoperist bûm:  
Wam dezanî,  
asmanî pan dewarêke,  
tenya bo min helldirawe.  
Zewî durrgey diway tofan e,  
cige le min,  
hîç kesêkî tiya nemawe.  
Evînî to lepîrr hat u  
şûre û qellamî xapûr kird,  
rrengekanî hemû gorî,  
yasakanî jêrujûr kird.  
Way kird dinya  
bo tenyayîm wek qefes bê.  
Fêrî kirdim –  
şewan nîw serînim bes bê!

1. 12. 1973. Varronêj

**ku deta** : îngîlab. **pêş to nasîn** : berî nasîna te. **minall** : zarok. **xweperist** : ji xwe hez kirî. **wam dezanî**: weha min hizir dikir. **dewar** : xêvet; kon. **tenya**: tenê. **helldirawe** : venane. **zewî**: zevî; erd. **durge** : girav. **cige le min** : ji bilî min. **hîç** : nekes. **ewîn** : evîn. **lepîrr** : ji nişka ve. **şûre** : dîwar. **qella**: kela. **xapûr kirin** : kavil kirin. **yasa** : qanûn. **fêrîkirin** : hînîkirin; hoykirin. **serî** : balgî.



## BO MORAG DONALLDSON

Lem jyaney pîrr hera da,  
le belemî şequşîrî  
ber tewjmî pêl û bada,  
zor detîrsim  
bazî giyanî xeyallgirî xom bizîr kem,  
mawem nebê  
dû pîrozey çawekanî to nemîr kem.

Le êstawe  
min xemxorî asmanîşim:  
Paş çawî to,  
êdî asman çon bitwanê,  
beyaniyan, ke radebê,  
le samallî xoy birrwanê!

4. 5. 1978. Moskow

**lem jyaney** : li vê jyanê. **hera** : qalmeqalm; qelebalix; têrêş. **belem** : kelek. **şequşîrî** : neliserhev; xîrxote; şikestî. **tewjm** : zerp; zor. **giyan** : can. **xom**: ê xwe. **bizîrkin** : windakirin. **mawem nebê** : fersenda min tune be. **le êstawe** : ji niha de. **çaw** : çav. **çon bitwanê** : çawa karibe. **beyaniyan** : sibehan. **samal** : sayî; semal. **birrwanê** : binihêre.

## DAYK

Bo Cemîle – ser dadexem.

Bo Jan Dark û Trêşkova – ser dadexem \*

bellam jinêk le xakî pîrr mergî min da,

pê le cergî xoy binêt û bibê be dak,

le ber pêy da kirrnûş debem,

nawçêwanim desûm le xak!

30. 8. 1979. Potsdam

\* Cemîle Buheyrêd : kiçe fîdakarî cezaîrî.

Jan Dark : kiçe qaremanî firensî.

Tirêşkova : yekem jine kosmonawt (gerdûngerr).

**dayk** : dê; dêyek. **ser dadexem** : serê xwe datînim; ditewînim. **bellam** : lê; heger.

**xak** : erd; ax. **merg** : mirin. **pê le cergî xoy binêt** : pê li cigerê xwe bike. **dak** : dê; dêk. **le ber**

**pêy da** : li ber pêyên (lingên) wê. **kirrnûş debem** : kunde; secde dikim. **nawçewan** : enî.

**desûm** : maç dikim.

## ŞİPIRZEYÎ

Ew rojey jiwanman heye,  
herçî destî bo debem:  
Piyalley ça, kitêb, qelem...  
hemû gullaw derdeden.  
Ew rojey jiwanman heye,  
hêşta zûwe û to dûri,  
endamekanî leşim  
nobetbirrî lêk deken:  
Çaw - rezî leşit derrnê,  
dest - be dengta helldeznê,  
guê - nuqmî bonit debê û  
mewday dûrît depêwê ...  
biriya detzanî, giyane,  
ew rojey jiwanman heye,  
çon serim lê deşêwê!

22. 11. 1979. Moskow

**şipirzeyî** : şerpezeyî. **jiwan** : jivan; randevû; soz. **herçî** : hertişt. **destî bo debem** : destê xwe davêjimê. **piyale** : qedeh; îskan. **gullaw** : gulav. **derdeden** : derdixin. **endamekanî leşim** : orxanên (lebatên) gewdeyê min; bedena min. **nobetbirrî** : nobetê dibirin. **derrinê** : diçine. **dengta** : dengê te. **helldeznê** : hildikşe. **guê** : guh. **nuqm** : noqbûn; fetisîn; xeniqîn. **bonit** : bîhna te. **mewda** : mesafe; bergeh. **depêwê** : dipîve. **biriya** : xwazîka. **serim lê deşêwê**: serê min gêj dibe.

## DARISTANÎ SÛTAW

Her nazdarê dillî damê,  
le binarî dillda naştim,  
wek nemamê.  
Ta wam lêhat,  
le say serî xoşewîstan,  
bûme maxoy şadaristan!

Ke tom nasî,  
ey nemamî şilk û nemir,  
wam zanî toşdeçîte pall ewanî tir:  
Derrwêy, debêt  
be fênkayî... bo hawînim.  
Be germayî ...bo zistanim.  
Keçî, lepîrr bûy be şemçe û  
Girrit berda daristanim!

## GREW

Hawîn bû,  
hawînê Kurdistan.  
Heyweşeu, samall bû.  
Le ser gazî pişt bûn,  
rayex giyay lapall bû.  
Asman pîr estêre,  
ser keylî xeyal bû.

Lenakaw pirsêk be bîrim da hat:  
“Erê estêrey êre û henderan heman estêren?  
Min dellêm cudan!  
Gerna çon hawkat lewên û lêren?!“  
Hemûyan gotyan:  
“Nexêr cuda nîn,  
hî êre û ewê  
heman pengir û jîley pîrrjawî le xor cêmwîn,  
denkî billawî heman tesbêhî hewda piçrrowin!“

Grewman kird û kewtîne sorax:  
Çûîne ber şiney dem û nefesî şêx û mellayan  
xêwetman hellda le ber tirîfey hizrî zanayan  
lêreman pirsî,  
lewêman pirsî ...  
hemûyan gotyan –  
“Ewaney lewên, emaney lêren,  
şikî tiya niye heman estêren!“

Le hengîr ra  
umrêk be ser ew şewe da têperrîwe...  
Dîsan le ser gazî piştîm,  
çawim le asman birrîwe.  
Gumanî ewsam, êsta yeqîne:  
Estêrenasî hemû cîhanîş be gijimda çin –  
etêrekanî dinyay henderan  
qet le estêrey Kurdistan naçin!

1. 3. 1992. Moskow

**heyweşew** : hêveşêv; êvareke hêvanî. **samall** : safî. **rayex** : nivîn. **lapall** : qedê çiyê; kêlek.  
**keyl** : tijî; mişt. **henderan** : derve. **pengir** : kuzût. **jîle** : kuzûtê biçûk û arî pê ve. **pîrrjawî** :  
belavbûyî. **xor** : ro; roj; tav. **hewda** : hevde. **sorax** : tehqîqkirin; lêgerîn. **şine** : sirwe; bayê  
hênîk. **xêwet** : xêfet; çadir; kon. **le hengîr ra** : di demê de. **be gijim da çin**: tinaziyan bi min  
dikin; bi yaqa min digirin. **xem**: xefet.

## ŞEHÎD

Duwênê şew xewim zirra,  
çûme derê be kirrî.  
Serî birûskawêjim  
berew asman hellbirrî:

Estêrem dîn, rûtuqût,  
pol pol, hezaran hezar,  
be dewrî qûy kurk da  
pert bûn wek denkehena...  
Hatmewe û pirsê dana  
bo ewan estêraney,  
ballengêwrau, gerdinlar,  
le herretî wirşe da  
dakişan ser berewxwar!

13. 7. 1992. Moskow

**xewim zirra** : xew li min herimî. **be kirrî** : bi bêdeng. **birûskawêj** : birûsk+avêj, ji birûskavêtinê. **hellbirrî** : bilind kir. **rûtuqût** : rûtûtazî. **pol pol** : kom kom; tof tof. **qû** : keravî. **kurk** : kurk-mirîşk. **pertbûn** : belav bûn. **pirse** : şîngirêdan. **ballengêwra** : ball + engêwra; bask + şikandî. **gerdinlar** : stûxwar. **wirşe** : rewşen; birîqe. **dakişan** : ketine xwar.

## BERAWIRD

Nîweşew bû,  
siruşt mat û dinya bêhest...  
Tu razabûy,  
rûmetit le ser piştî dest.  
Le adgarit wirdbûmewe:  
Pêlî şewbo hellîgirtim,  
rayhejandim awazêkî cawîdanî,  
kitêbekey destim daxist,  
xom reha kird le zîndanî -  
rûy pîrozî tom xwêndewe,  
nerme nerme  
ayet ayet,  
ta beyanî!

13. 6. 1993. Tşîrkova

**berawird** : danberhev. **mat** : bédeng; hêmin. **rûmet** : rûçik. **adgar** : sîma; rûxsar,  
**wirdbûmewe** : lê hûrbûm. **şewbo** : navê kulîkekê ye, ku bi şev bêhn dide. **cawîdanî** : abedî;  
sihrî. **rehakirdin** : azadkirin.

## LÊKDABIRAN

Kware bê, ya kazêwe,  
xoretaw bê, ya şillêwe;  
le her kuê bît:  
Le naw kone eşkewtêka,  
ya şarêkî pîrr hatehat;  
le kuncêkî tarawgeda,  
ya zincêkî kawlewillat;  
her katêk meylit lê bê,  
min debime ba û be çirkeyek degeme lat.  
To hîç na, her hênde bike,  
birro, dirextêk raspêre,  
çoleke dewreyan dabê.  
Birro, cogeyêk raspêre,  
peykî pêlî be aga bê.

13. 12. 1993. Moskow

**kazêwe** : berbang. **xoretaw** : rojeke tavînî. **tarawge** : surgunî. **zincêkî** : koşekî. **kawlewillat** : welatê kavilkirî. **çirkeyek** : saniyek. **dirext** : dar. **çoleke** : çivîk. **coge** : cobar. **peyk** : postecî; **namebir**; qasid.



## PIRÊSKE

Engustîley kameranîm  
le naw pirêskayek da ye.  
Pêyan gotûm,  
tenya carêk tûşî debim,  
her carêk û îtir tewaw.  
Boye, rastî her ciwanêk bêm,  
bew pirêske efsûnawiyem dête berçaw.

1. 3. 1995. Moskow

**pirêske** : boxçe; piyazok. **engustîle** : gustîlk. **pêyan gotûm** : bi min re gotin. tûşîbûn : lêrasthatin. **efsûnawî** : sîhrî; cadûyî.

## AŞTÎ

Takû çemêk nihênî xoy  
be çemêkî tir bispêrê,  
takû şaxêk le ber şaxêk dabêtewe,  
tewir be dar... Girme be çirpey newêrê -  
pêşniyazêkim heye bo Xwa...  
Xwaye, tobe!  
Pêşniyaz nakem!  
Le berit deparrêmewe...  
Deparrêmewe ta mirdin:  
To wa bikey, nêrîş wek mê,  
bikewête zawzê kirdin!

17. 10. 1995. Korso

**tewir** : tevir. **girme** : şirîqe. **çirpe** : pistepist. **zawzê** : zayîn; zaroanîn.

## ÎDYA

Çend rojêke,  
îdyayî şî îrê ,  
wek melêkî spî tîjball,  
lêm nagerrê û lêm nagerrê,  
Herçend xomî lê win dekem,  
le pirrêka  
hewrî bîrim deqlîşênê û tê de perrê.  
Heda nadem!  
Nazanim key  
ew ballinde kêwîleye helldenîşê?  
Key ram debê? Key lêm radê?  
Dellêy jine!  
Daway dekewim - bom nagîrê.  
Dekşêmewe - be diwam da dê.

29. 1. 1980. Budapêst

**îdya** : raman; hizir; bîr. **xomî lê win dekem** : xwe ji ber winda dikim. **le pirrêka** : ji nişka ve.  
**bîr**: raman; hizir. **tê de perrê** : tê re derbas dibe. **heda nadem** : rihet nabim; aram nabim;  
hewdan nabim. **kêwîle** : çiyayî. **helldenîşê** : dinîşe. **key ram debê** : kînga ji min re kedî dibe.  
**lêm radê** : hogirî min bibe. **dellêy** : tu dibêjî. **diway dekewim** : li dû diçim. **bom nagîrê** :  
nikarim bigirim. **dekşêmewe** : jê vedikişim. **be diwam da dê** : bi pê min dikeve.

## BO QERECEKÊ

1

Bes temaşay naw lepim ke!  
Xo min namewê pê m billêy,  
debim be bawkî çend minall,  
zengîn debim, ya herwa lat...  
Tenya ştekim pê billê:  
Heta mawim wek to dejîm,  
yaxo debime xawen willat?!

25. 2. 1980. Moskow

**naw lep** : nav lêpê. **bawik** : bav. **lat** : hejar; feqîr; destteng. **tenya** : tenê. **ştek** : tişte. **pê billê**  
: ji min re bibêje. **mawim** : dimînim. **xawen** : xwedî.

2

Asmanî to – ber pêy xote.  
Serit şor ke,  
milit keç ke,  
çaw megêrre  
bo asman û estêre û Xua -  
ewey bistêk xakî nebê,  
Xua û estêre û asmanî kua?

18. 1. 1982. Potsdam

**ber pêy xote** : ber lingê te. **şorkirin** : daxistin; tewandin. **keçkirin** : xwarkirin. **çaw megêrre**  
: çavên xwe negerîne. **bistêk** : bihostek. **xak** : erd; ax.

3

Meraq mexo,  
sexllet mebe, min bo to me.  
Berî destim kes têy naga -  
nihêniyekey her lay xo me.  
Nawlep niye!  
Nexşeyekî pirr newal û çiya û çom e.

29. 2. 1992. Moskow

**sexllet** : hizan; îz`ac. **ber** : lep. **lay xome** : li cem min e. **nawlep** : navlep. **nexşe** : xerîte. **çom** :  
çem; gelî.

## **KIRRÊWE**

Kirrêwe bû, dinya bû lêll...  
lepim kirde  
laney kiluwebefrêkî wêll.  
Wek aşiqêk, ta tiwayewe têmriwanî.  
Ke bû be aw, nasîmewe:  
Le Kurdistan  
dillopêk bû... le naw kanî!

12. 1. 1981. Moskow

**kirrêwe** : bager. **lêll** : şêlû. **lane** : êwr; hêlîn. **kiluwebefir** : kuliye berfê. **wêll** : bêwar.  
**tiwayewe** : pişafîye. **têmriwanî** : bi dêqet, bi baldarî lêniherîn. **aw** : **nasîmewe** : min nas kir.  
**naw** : nav.

## RAMANÊK

Hawrrêm!  
Duwênê, demeu êware bû,  
ta billêy bîrî tom dekird.  
Kiz danîştibûm,  
seyrî zerdey asom dekird.  
To dezanî  
çon hetawim hate ber çaw?  
Wek kîjêkî  
kezî zerdî gerdenbirraw!  
Her ewsake,  
birryarim da  
zimanî xom bisûtênim,  
heta mawim  
to be hetaw neşubhênim!

18. 2. 1981. Potsdam

**hawrrêm** : rêheval; hevalê/a min. **duwênê** : do. **ta billêy** : ta bibêje. **kiz** : xemgîn; melûl. **her ewsake**: her di wê bêhnê de. **bisûtênim** : bişewitînim.

## JIWAN

Hawrrêm!

To pêm nallêy,  
kê nihêniy em jiwane dirkanduwe?  
Çi destêk, bem nîweşewe,  
bineşewboy em hewalley tekanduwe?  
Lew satewe ke to hatûy  
tirîfey mang – be pêdize dête jûrê.  
Sirwe - perdey pencerekem delerênê.  
Gela - deçête tek gella u  
razî jiwani em şeweman deçirpênê.

Hawrrêm?

To pêm nallêy,  
kê nihêniy em jiwane dirkanduwe?  
Çi destêk, bem nîweşewe,  
bineşewboy em hewalley tekanduwe?!

16-17. 7.1981. Potsdam

**hawrrêm** : rêhevala min. **dirkanaduwe** : lixwenaye; eşkere kiriye; îqrar kiriye. **hewalle** : nûçe. **tekanduwe** : hejandiyê. **tirîfey mang** : tava heyvê. **be pêdize** : bi dizî. **jûr** : ode. **delerênê** : dihejîne. **raz** : nepenî. **deçirpênê** : dike pistepist.

## RÛBAR

Herçend min û to awêteyin  
wek xak û xollî yek zewî,  
bellam çi bikim!  
Tawêk niye, niştimanîm wekû rûbar,  
besermanda ranebûrê u  
letman neka wek dû kenar!

17. 7. 1981. Moskow

**rûbar** : çem. **awêteyin** : tev li hev in. **xak û xoll** : ax. **tawêk** : bîhnek; demek. **ranebûrê** :  
naherike, **letman neka** : me nake du perçe.



## ŞADÎ

Şadî zewî wekû xore -  
tawêk diyar e, tawêk bizir.  
Elha dekem biçime asman,  
takû le wê bibime rêgir.  
Şadiyeket bo dagîr kem,  
ne xem bigate kenarî,  
ne jakan belayda ret bê...  
şadiyek bê,  
le asmanan - her estêre,  
le ser zewîş - her to het bê!

25. 9. 1982. Moskow

**xor** : roj; tav. **bizir** : winda. **elha** : daxwaz; arezû. **jakan** : çelmisîn. **belayda** : bi ser de. **ret**  
**bê**: derbas be.

## LEDAYIKBÛN

Guwê m le hawarî netewekem e...  
bellam dillniyam  
cîhanî sibey guşad û rûn e:  
Ledaykbûnî minallim dîwe -  
qîrre û lîngkutan  
yekem nişaney ledaykbûne!

20. 5. 1987. Trablus

**guwê m** : guhê min. **dillniyam** : dilnivîn im. **guşad** : fireh; fere. **lîngkutan** : pîkolî.

## LÊKDANEWE

Wa çirkesatî lêkdaneweye –  
herçî pirêske u  
şirredefterî kelawey yade,  
hemûm hellxistûn wek bazirganê...  
Peşîmanim û peşîmanîş nîm,  
kewa sedefî sedan leş gerram  
bo dozînewey mirwarî giyanî!

2. 8. 1997. Hêlsinkî

**lêkdanewe** : şirovekirin; hizrir kirin. **pirêske** : “çiqin” . **şirredefter** : deftera diryayî; perpwît.  
**kelawe** : kavi; xirbe. **dozînewe** : dîtin. **sedef** : nexweşiyeye xedar.

## **ELARM**

Min: seatêkî zengdarim.  
Bo ewe bûm,  
ta le kat û satî xoy da  
bo zenglêdan le xew rabim.  
Dugmey dengim her lay merge,  
ta ew rojeş zeng lê dedem,  
lê dedem û bêdeng nabim!

30. 3. 1998. Hêlsinkî

**zengdar** : bi zengil. **dugme** : mi`irîk; bişkoj. **merge** : mirin.

## **XELLAT**

Jînêkî tirim xellat ke, Xwaye!  
Ba kurt bê wek hî gull û perwane.  
Be her bistê erd min qinyat dekem,  
bellam tiya nejîm wekû bêgane!

11. 4. 1999. Hêlsinkî

**bist** : bihost. **Xweye** : Xwedê. **bellam** : lê belê

## HEWÊ

Ba be taqî tenya bim.  
Ne sîrrey dergem dewê,  
ne tirpey hengawî to –  
Lêm dûrkewe, azîz im,  
min şellallî şî irêkim  
le ser sîhrî çawî to!

29 .4. 1999. Hêlsinkî

**hewê** : hewî. **taqî tenya** : bi tekten. **sîrre** : dengê derîvekirinê. **derge** : derî. **tirpe** : teperepa pê. **hengaw** : gav. **şellall** : sulav; şîp. **min şellallî şî irêkim** : ez sûlava helebestekê me.

## PÎRÎ

Katê, çaran,  
temî xemêk, le sed pêç û kenarewe,  
şepol şepol, qef qef dehat,  
daydegirtim be tirok û binarewe:  
Bîrim lewe dekirdewe,  
ke sewdayek, îşqêkî nuwê...  
Sibey bi darî umrewe  
gopke deka û depişkuwê.  
Keçî êsta,  
ke dilltengî qangim deda,  
ke debînim êcgar matim –  
Bîr le ciwanêk dekemewe,  
ke fillan sall,  
le fisar cê tûşî hatim!

3.5.1999. Hêlsinkî

**şepol** : pêl. **qef** : qefl; kom; tof. **alqe** : eleqe. **qang** : dû; dûman. **qangdan** : dûderketin. **fisar cê** : cihê ne eşkere. **fillan cê** : cihê ne aşkere. **tûşîhatin** : lêrasthatin.

## XEWN

- „Xewim nayê,  
detirsim birrom winit kem.  
Xewim nayê.  
Rojanman – ewaney mawin –  
be pencey dest dejmêdirên,  
çend dillope şewnimêkî ber hetawin.  
Detirsim birrom winit kem.  
Xewim nayê.“  
- Binû giyane.  
Bîr le deryayêk bikewe  
ke hêndey çawî xot meng bê,  
bîr le esmanêk bikewe  
hêndey janî min bêdeng bê.  
Xem mexo.  
Hêmin be.  
Binû  
diwênî xewnêkî xoşim dî,  
le xewnma:  
Mîrov hezar destî hebû  
her destêkîş,  
wek dirextêk,  
hezaran pencey girtibû!

11.7.1975. Igomînka

**birrom** : biçim. **winit kem** : te winda bikim. **pence** : tilî. **binû** : bixewe; razê.



## HEM TOM XOŞ DEWÊ HEM EWÎŞ

Ke min tenya carêk bijîm:  
Hem tom xoş dewê, hem (ew)îş.  
Ke min tenya carêk bijîm:  
Ne tîşkî roj detorênim,  
ne tirîfey mangeşewîş.  
Eger du car jiyabam:  
Xoşewîstim her to debûy, lemeyana.  
Lewîtira, ewim dekird be taqane!  
Bellam çib kem!  
Ke min tenya carêk bijîm,  
çarem niye:  
Hem tom xoş dewê, hem (ew)îş.  
Hem tîşkî roj deperistim,  
hem tirîfey mangeşewîş!

16. 3. 1979. Moskow

**tom xoş dewê** : ji te hez dikim. **tirîfe** : hêvtav. **lemeyana** : li vê jiyanê û li ya din. **taqane** : bitenê.